**Şîret bo penaxwazin: MEŞANDINA KARÊN XWE LI DAÎREYA KOÇBERAN**

**Giring e bizanî**

- Li ser doza te ya penaxwaziyê bersiv bi telefonê nayên dan, çunkî nayê zanîn ka kesê telefonê dike kî ye.
-
- Belavoka Agahî bo penaxwazan ku ji te re hatiye dan baş bixwîne. Tu dikarî herwiha gelek agahiyan ji malpera me jî wergirî: www.migri.fi.
- Eger hinek pirsên te li ser doza te ya penaxwaziyê hebin, pêşî ji parêzer an avukatê xwe bipirs eger hebe yan jî ji karmendên navenda pêşwazîkirina penaxwazan.
- Tu dikarî tenê bi rêya posteyê agahiyan ji Daîreya Koçberan wergirî bi navnîşana PL 18, 00581 Helsinki.
- Navenda pêşwazîkirinê biryarê li ser daxwaza te nade û nikare tesîrê li ser meşandin û biryara doza te bike.

**Eger pirsên te li ser lêpirsîna te ya penaxwaziyê hebin**

- Daîreya Koçbera dê demekê bo te bo lêpirsîna penaxwaziyê diyar bike.
- Di nameya gazîkirinê de zimanê tercumeyê, dema deqîq ya lêpirsînê û navnîşana cihê wê hatine nivîsîn. Di nameyê de navê terciman û lêpirskerî nayên diyarkirin.
- Guherandina dema lêpirsînê ne mimkin e. Eger bo nimûne tu nexweş bibî, di zûtirîn demê de ji karmendên navenda penaxwaziyê re bibêje.

**Eger tu bixwazî parêzerê te were lêpirsînê**

- Heqê te heye ku parêzer an avukatê te hebe.
- Eger tu parêzerekî bixwazî, têkiliyê bi daîreya alîkariya huqûqî re bike. Eger lazim be, navenda pêşwazîkirinê dikare alîkariya te bike.
- Adeten parêzer di lêpirsînê de hazir nabe. Parêzer dikare destheqê xwe bo hazirbûna di lêpirsînê de tenê hingê wergire, eger hazirbûna parêzer ji ber hin sebebên giran lazim be. Parêzer bi xwe qerara hazirbûna xwe dide û daîreya alîkariya huqûqî jî qerarê li ser wê dide ka parêzer dikare destheqê xwe bo hazirbûnê di lêpirsînê wergire yan na.
- Eger tu bêyî bêdabên xwe hatibî penaxwaziyê, nûner an temsîlkarê te dê parêzerekî huqûqî bigire.

**Eger t uhin agahiyên zêdetir bişînî yan bixwazî bizanî ka ew agahiyên ku te şandine gihiştine**

- Eger lazim be, parêzerê te yan jî karmendê navenda pêşwazîkirinê dê alîkariya te bike

**Dixwazî li ser izna karkirinê bipirsî**

- Agahiyên pêdivî yên derbarê izna karkirinê dikarî ji malpera me wergirî: http://www.migri.fi/turvapaikka_suomesta/tyonteko-oikeus
- Eger karekî bibî, divê xwediyê karê te piştrast bibe ku te izna karkirinê heye. Xwediyê karê te dikare bi telefonê wê bipirse. Hejmara telefonê li ser malpera me heye û tenê xizmeta xwediyên karî dike.
- Divê tu ji xwediyê karê xwe re bibêjî gava ku izna te ya karkirinê nemabe.

**Piştî lêpirsîna penaxwaziyê dixwazî bizanî, daxwaza te di çi merheleyê de ye û gelo qerar hatiye dan yan na**

- Di lêpirsîna penaxwaziyê de bo te demeke texmînî tê dan û di wê demê de ti texmîneke din ya nû nayên dan.
- Eger dema texmînî ya diyarkirî derbaz bûbe, parêzerê te yê huqûqî yan karmendê navenda penaxwaziyê dikare dîsa ji Daîreya KOçberan bipirse.
- Mumkin e ku meşandina daxwaza te ji dema texmînkirî dirêjtir be. Tu dikarî li dema navincî ya meşandina dozan li ser malpera me binêrî: http://www.migri.fi/nain_palvelemme/kasittelyajat.
- Ne baş e ku rewşa daxwaza xwe li gel yên din muqayese bikî, ji ber ku dema meşandinê li gor daxwazê û dijwariya meseleyê diguhere.

- Eger te hin sebebên lezandina dozê hebin, li gel parêzerê xwe yê huqûqî yan jî karmendên navenda pêşwazîkirinê bike. Daxwazên lezandinê divê bi nivîskî bi û bo vê navnîşanê bên şandin: Maahanmuuttovirasto, PL 18, 00581 Helsinki.
- Têkilîkirinên bi telefonê alîkariya te nake bo meşandina doza te bi leztir.

**Tu bixwazî piştî qerardana Daîreya Koçberan li ser doza xwe bipirsî**

- Têkiliyê li gel parêzerê xwe yê huqûqî yan jî karmendên navenda pêşwazîkirinê bike.
- Eger tu itirazê li qerara xwe bikî, hingê bersiva pirsên te ew dezgeh dide ku itiraza te lê ye, bo nimûne dadgeha îdarî yan jî dadgeha bilind ya îdarî.